

**KOMELEYA BERÎ HER TIŞTÎ ZAROK**

**BELGENAMEYA HELWESTA LI SER ‘WEKHEVÎYA ZAYENDA CIVAKÎ’**

**2018**

# Komeleya Berî Her Tiştî Zarok

## Belgenameya Helwesta Li Ser 'Wekhevîya Zayenda Civakî'

**BINGEH**

"Komeleya Berî Her Tiştî Zarok", proseyên îhmal û îstîsmarê, li ser 'esasên beyana mexdûran dinirxîne. Her cure destdirêjî, mêtinkarîya cinsîî, îstîsmara cinsîî û bûyerên tundûtîjîyê yên li dijî mirov an jî candaran pêk hatine, wek bûyerên êrîşkarîyê tên qebûlkirin û komeleya me, li gor pêwîstîyên mexdûrên bûyerê nêzîkî van mijarê dibe. Hemû xebatkar, xwebexş, endamên lijneyan, stajyer, kesên ku ji komeleyê piştevanîyê distînin û hwd. di navbera hemû kes û pêkhateyên xwe da, Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, li ser bingeha "wekhevî"yê tevdigere. Herwiha, di bûyerên êrîşkarîyê da, komeleya me li ser 'esasê taybetîbûna bûyerê, helwesta xwe bi awayekî zelal nîşan dide. Di heman demê da Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, li ser têkoşîna li dijî tundûtîjî û destdirêjîyê, pabendê xalên sereke û prensîbên bingehîn ên CEDAWê (Zagona Navneteweyî ya Mafên Jinan), ILO190ê (Peymana Navneteweyî ya Tundûtîjî û Destdirêjîyê), Beyannameya Navneteweyî ya Mafên Mirovan, Peymana Mafên Zarokan ya Neteweyên Yekbûyî û Peymana Stenbolê ye. Bi ser da jî komeleya me, ji bo ku xebatkar û kesên têkildarê komeleyê perspektîfa wekhevîya zayenda civakî bipejirînin, perwerdehîyan dide û civînan li dar dixe û eger hewce bike van perwerdehî û civînên xwe berfirehtir dike.

**POLÎTÎKAYA BINGEHÎN A TEKOŞÎNA LI DIJÎ ÊRÎŞ Û CUDAKARÎYÊN ZAYENDA CIVAKÎ:**

Armanca vê belgenameyê ew e ku ji bo rêlibergirtin û bersivdayîna cudakarî û êrîşkarîyên li ser zayenda civakî, nêrîn û ramanên"Komeleya Berî Her Tiştî Zarok" zelal bike û ji bo vê yekê jî hin xalên sereke, bi vî rengî eşkere dike:

- Ji bo her kesê têkîldar (zarokên ku komele xizmetekê pêşkêşî wan dike, xebatkarên komeleyê, xwebexş û piştevanên komeleyê, stajyer û endamên komeleyê û hwd…) Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, dixwaze atmosfereka ewle û hurmetdar ya xebatê pêk bîne û ji bo vê jî stratejî û mudaxeleyên berbiçav pêşkêş dike.

**PÊNASEYÊN ZAYENDÊ**

Ev pênaseyên cuda yên zayendê, li gor normên navneteweyî hatine qebûlkirin.

a) **Zayenda Tayînkirî:** Zayenda ku li gor taybetîyên fîzîkî ên genîtal, ducanîbûn an jî zarokanînê hatiye dîyarkirin, wekî "zayenda tayînkirî" tê qebûlkirin. Piranî wekî "keçik/lawik" an jî "jin/mêr", bi du pênaseyên sereke tê sînordarkirin. Her çend wekî "zayenda bîyolojîk" an jî "zayenda bedenî" bê pênasekirin jî, derveyî beyana kesan ji alîyê tibê ve tê qebûlkirin, lewma jî wekî "zayenda tayînkirî" bihête bikaranîn dê rasttir be.

b) **Zayenda Civakî:** Gelek caran bi zayenda tayînkirî ra hevterîb û guncav tê qebûlkirin û ji bo pênaseya wê, normên çandî yên wekî "mêranî" û "jinanî" tên bikaranîn.

   Mirov, normên zayenda civakî di nav malbatê da, li dibistanê, li kargehê an jî li ser platformên medyayê dibîne, fêrî wan dibe û bêyî hemdê xwe qebûl dike. Ango rolên li ser zayenda civakî hatine pênasekirin, ne pîroz, mayinde û teqez in. Têgehên wekî "nasnameya zayendî", "meyla zayendî" û "îfadeya zayendî" jî di nav pênaseya "zayenda civakî" da cih digrin. Nasnameya cinsî tevlihev, guherbar û taybet e ji bo her kesekê. Lewma jî wekî pergala nasnameyî ya li ser dubendîya jin û mêran hatîye avakirin, pênaseyên teqez ên li ser nasnameya zayendî jî ne siruştî ne û ji hîyerarşîya neheqane a civakî derketîne meydanê. Nasnameya zayendî ne pîroz û mayinde ye; dibe ku biguhere û veguhere.

c) **Mêtinkarîya Cinsî:** Ji bo bidestxistina berjewendîyeka maddî û sosyal, bikaranîna cinsî ya mirovann an jî candarên ku nikarin xwe biparêzin, wekî mêtinkarîya cinsî tê pênasekirin.

d) **Îstîsmara Cinsî:** Êrîşkarî û destdirêjîya bi darê zorê an jî bi gefxwarinê, mudaxeleya fîzîkî an jî kiryarên xirab yên cinsî yên li hemberî mirov an jî candarên din, wekî îstîsmar tên binavkirin.

Îstîsmara cinsî, divê bi êrîşkarîyên zarokane an jî bi lîstikên meraqa cinsî neyê tevlihevkirin. Ji bo ku bûyerek wekî îstîsmar bê qebûlkirin, divê alîyekê bûyerê, mirovekê mezin/reşîd be. Îstîsmara cinsî, dibe ku li ser cîhana vîrtuel an jî medyaya civakî jî pêk bê û temas tune be jî wek îstîsmar tê qebûlkirin. Mezinên ku zarokan

îstîsmar dikin, wekî ku tê zanîn, ne biyanî ne; piranî xizm û eqrebayên zarokan in ku ji alîyê wan zarokan ve tên hezkirin û hurmet ji bo wan tê nîşandayîn. Kesên ku îstîsmar dikin, piranî vê hezkirin, hurmet û ewlehîyê bi xirabî bi kar tînin. Eger îstîsmar di nav malbatê da pêk bê, wekî "îstîsmara cinsî ya navmalbatî" tê pênasekirin.

Zarok, bi saya parastin, piştevanî û alîkarîya pisporan, dikarin xwe ji bandorên neyînî yên îstîsmarê xelas bikin, baş bibin û di jîyanê da bibin mirovên serkeftî û bextewar. Gava pêşî ew e ku xeleka bêdengîyê bê şikandin, bûyera îstîsmarê bê ragehandin û sûcdarê îstîsmarê bi awayekî 'adilane bê cezakirin.

e) **Destdirêjî:** Her cure reftarên cinsî ku ji aliyê kesekê ve nayê xwestin û ji bo mexdûrê bûyerê dibe sebebê biçûkxistin, heqaret û zordayînê, wekî destdirêjî tê qebûlkirin. Dibe ku bi şertê îstîhdamkirinê an jî gefxwarinê, destdirêjî bê domandin û pêkan e ku destdirêjî di kargehekê û di dema kar da pêk bê. Bi awayekî ne-zelal wekî reftar û tevgerên destdirêjîyê bên qebûlkirin jî, piranîya êrîşkarîyên bi vî rengî, di nav xwe da gelek tevgerên cuda dihewînin. Dema hêvî û daxwazên mexdûrên destdirêjîyê li ser bûyerê tên diyarkirin, divê bi nêrîneka mexdûrane bûyer bê nirxandin.

f) **Êrîşkarîya cinsî:** Bûyerên êrîşê yên ku bêyî daxwaza mirovekê rû didin û piranî di nav xwe da êrîşeka fîzîkî dihewînin, wekî êrîşkarîya cinsî tên pênasekirin:

**ARMANC**

Wekî Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, li dijî cudakarî û êrîşkarîyên li ser zayenda civakî, armancên me ev in.

a) **Çanda sazîyê ya ji bo êrîşkarîyê bê tolerans e:** Prensîba sereke ya komeleya me li dijî êrîşkarî û cudakarîya zayendî ew e ku bi tu awayî tolerans ji bo van bûyeran neyê nîşandayîn, mafên mexdûran bên parastin, rê li ber îhmal û îstîsmaran bê girtin û ji bo her bûyerê bi zelalî hesab bê dayîn. Ji bo vê jî çanda sazîyê ya bê tolerans, ji bo her cure êrîşkarîyên cinsî, bingeha helwesta me nîşan dide.

b) **Mekanîzmayên ewle yên ragehandinê:** Em her tim piştevanîya kesan, pêkhateyan, xebatkarên komeleyê û şirîkên kar û xebatên komeleya xwe dikin ku

xwe di warekê ewle de hîs bikin û baş pê bizanin ku her cure êrîşkarî û cudakarî dihête raporkirin. Proseya darizandinê jî li gor bingeha hurmetdayîna mafên mirovan tê meşandin, bûyer bi vî awayî tê nirxandin û ji bo ku xebatkar û pêkhateyên komeleya me bikaribin ji rewş û bûyerên êrîşkarîyê hayedar bin, wek komele em perwerdehîyan li dar dixin û rêberîya xebatkarên xwe dikin.

c) **Lêpirsîna bilez, ewle û sepandina ceza û mi'eyîdeyan:** Di bûyerên îhlal û îstîsmarê da Lijneya Dîsîplînê ya Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, lêpîrsînên bilez û ewle pêk tîne û proseya cezakirinê bi awayekî 'adilane dimeşîne.

d) **Mudaxeleya li gor nêrîna mexdûrê bûyerê:** Em alîkarî û piştevanîyê didin mexdûrê bûyerê, bi dahat û çavkanîyên têrker piştgirîyeka domdar dikin ku mexdûr bikaribe bijî û bi awayekî ewle û aram jîyana xwe berdewam bike.

e) **Li dijî êrîşkarî û cudakarîya li ser zayenda civakî, tevlêkirina tekoşînê ya kes û pêkhateyan:** Takekesan, zarokan, xebatkarên Komeleya Berî Her Tiştî Zarok, kes û pêkhateyên ku di kar û barên me da cih digrin an jî di tora me ya ragehandinê da ne, em wek piştevanên tekoşîna xwe dibînin. Li hemberî êrîşkarîyên cinsî, mêtînkarîya cinsî, destdirêjî û îstîsmarê, an jî ji bo rêlibergirtin û bersivdayîna her cure êrîşkarîya zayendî, em hewcedarîyên wan tînin cih û wan wezîfedar dikin.